

## Peywendîyên li kantona Neuchâtel

Polîs	117
Ambûlans	144
La Main tendue (dest dan)	143
Pro Juventute (Xeta zarok û ciwanan)	147
Cih an rûniştina acil	0800 880 480

### Xizmeta alîkarîya qurbanîyan (SAVI)

Xizmeta piştewaniya qurbanîyan (guhdarî, piştgiriya derûnî, agahdariya civakî û yasayî) û mala pêşwaziyê ( cih ji bo jinan û zarokên wan)

Şêwir (muayene)	032 889 66 49
Nobedarîya ji bo tundîya navmalî	032 886 46 36

### Xizmeta ji bo sûcdarên şideta navmalî (SAVC)

Koma Piştgiriya ku armanca wan ew e ku alîkariya sûcdaran bike ku dawî li şideta navmalî binin, çi bedenî, devkî, derûnî û zayendî.

032 886 80 08

### CUP (Navenda Lezgin a Psikiyatrik)

032 755 15 15

### Navenda Neuchâtel ji bo Psikiyatriyê - Zarok û Ciwanan (CNPea)

Şêwirmendiyên pizîşkî-psîkolojîk ji bo zarok û ciwanan

Montagnes (Çiya)	032 755 23 51
Littoral (Peravê)	032 755 23 11

### Şêwirmendiya jinûmêr û malbatan li danûstandinên tund ya CNP

Montagnes (Çiya)	032 755 24 51
Littoral (Peravê)	032 755 14 68

### Navenda Tenduristiya Zayendî - Plansaziya Malbatê

Montagnes (Çiya)	032 967 61 87
Littoral (Peravê)	032 717 74 35

Ji bo bêtir agahdarî û navnişan, vê koda QR-ê bişopînin



## TUNDÎYA NAVMALÎ NAYÊ PEJIRANDIN Û CEZAYÊ WÊ HEYE



ALÎKARÎYÊ BIXWAZE !

## YASA WE DIPARÊZE : BANGÊ LI POLÎSAN BIKIN

Mafê polîsan heye ku kesê li dijî endamekî malbatê tundiye dike **bigre û bibe polîsxaneyê**. Her weha dikare kesê tund çend rojan ji mal û derûdora wî derxîne û ketina hin cih û avahîyan li wî qedexe bike. Qurbanî dikare ji dadgehê daxwaza tedbîrên demdirêjtir bike.

**Hin rewşên tundîya navmalî bi erka fermî (bêyî gilî) têne darizandin.**

Gilîkirin dihêle ku hûn di doza sûc de nerîna xwe dîyar bikin û bighên dosyayê.

## HÛN DIKARIN ALÎKARÎYÊ WERBIGIRIN

Tevî ku hûn nexwazin bangê li polîsan bikin jî, hin alî an xizmet hene dikarin li we guhdarî bikin, şîretan bidin we eger hewce hebe,

- rûniştina li hostelê saz bikin
- alîkarîya darayî ya gengaz berçav bikin
- we jî mafê we agahdar bikin

Bi taybetî, bi Xizmeta Alîkarîya Qurbanîyan (SAVI) re têkilîyê deynin. Şêwirmendî belaş û nehênî ne. Ew dikarin ji we re wergêrekî jî amade bikin.

## HÛN DIXWAZIN DEV JI MALA ZEWACÊ BERDIN ?

Mafê we heye ku hûn ji **mala zewacê derkevin**, eger hûn qurbanîyên tundîya navmalî bin an jî eger hûn hest bikin ku hûn di bin gefê de ne. Yasa destûrê dide we ku hûn li parastinê bigerin. Herin cem kesên cihê bawerîya we. Cihê rûniştina acil ya demkî dikare an we bi tenê an tev zarokên we bicih bike. Li gorî pêkanan, di rewşa destdirêjtî an lêdanê de hûn dikarin ji pijîşkekî bixwazin **raporeke pijîşkî** ya bi hûrgilî amade bike ya ku tê de hemî şop û birînên ku ji destdirêjîyê hatine encamdan û di nav de jî yên psîkolojîk (şok, fikar, kêmxewî). Ev yek ji we re dibe belgeyek kêrhatî yê ku dibe ji bo we bisûd be.

Qurbanîyên ku ew bi paşerehên xwe biyanî ne, di bûyera veqetandinê an jî hevberdanê de destura xwe ya mafê rûniştinê bi rengê otomatîk wenda nakin. Lê belê ew ji muayeneyeke taybet sûd werdigrin. Ku rewşa wan ya kesane û mercên taybet yên her dozekê li berçav digre. Xwe agahdar bikin!

**Ji bo bidawîkrina tundîyê, gava yekem ewe ku li ser wê biaxivin**

## HIŞYARÎ BÊJE BESE!

Tund heye.

Ew...



Bêyî erêkirina te dest davêje te, te îcbar dike pêre seks çêke



Te dehf dike, te dikşîne, sîle li te dixê, te dihejîne, li te dixê an heqartê li te dike



Gefên devkî an bedenî li te dike



Gefan li te dike ku wêne an vîdyoyên te yên kesane û întîm biweşîne



Şantajên aktîf li te dike, dibêje ezê xwe întîxar bikim



"hêrs dibe" dixeyîde gava ku tiştêk ne bi dilê wî be



Îsrar dike ku tu jê re wêne û vîdyoyên întîm bişîne



Nerîn û projeyên te bi çûk dike, nerîna ne wek ya wî be napejirîne



Te kontrol dike, fermanan dide te, te dixê bin çavan



Te paşguh dike, guh nade te, te rezîl dike



Çavnebare, te wek milkê xwe dibîne



Kenê xwe bi te dike, te şermezar dike



Te ji heval û malbata te îzole dike



Di nav telefona te ya destan û tiştên te de digere (teftîş dike)



Derketin, cil û makyaja te kontrol dike



Li ser biryarên girêdayî we herduyan nerîna te dixwaze



Bexteware gave ku tu dilşad be



Bawerî bi te dike



Heval û malbata te qebûl dike



Rêzê li kes, nerîn, biryar û zewqa te digre

## XWE 2

Xeter li ser te heye

Ew...

## SÛD WERGIRE!

Têkilîya te tenduriste

Ew...

Ji bo têkilîyek tendurist di navbera hevjinan de

# PÎVANA RÊZGIRTINÊ